

# flashhilat

*fanzîna ji fotografîyê dinizile*

**HEJMAR: 4, GULAN 2019**

*Mehê carê derdikevim. Kesên dixwazin fotograf û nivîsên wan ên li ser fotografîyê di ser min re belav bin, dikarin wan ji [flashhilat@gmail.com](mailto:flashhilat@gmail.com) re bişînin.*

**Edîtor: Omer Faruk Baran**

**Berpirsa Belavkirinê: Leyla Arısoy**

**flashhilat, HEJMAR: 4**

**Çapa 1ê: 100 nusxe, Riha - Gulan 2019**

**Çapa 2yan: 100 nusxe, Riha - Gulan 2019**

**Çapa 3yan: 30 nusxe, Dîyarbekir – Îlon 2019**

 **flashhilat**  **flashhilat**  **flashhilat.fanzin**

## SILAVA EDÎTOR

Nîvroyeke biharê ye; berpîrsê me yê medya civakî di telefonê de dide zanîn ku çapa duduyan a hejmara me ya yekê û ya duduyan hindik mane biqedin û hişyariyê dide ku em bo aboneyên nû û kesên fanzînan yek bi yek dikirin herin hazirîya çapa nû bikin. Daneyên hesabên me yê Instagram û Twitterê nîşan didin ku di 24 saetan de çavên bi deh hezaran kes li wêneyê Hîdayet Xanimê ketine. Hesabê me yê bankayê radigihîne ku 50 lîrayên din ketiye hesabê me, ji Mersînê, ji Mêrdînê, ji Dêrsimê, Batmanê, ji Wanê, ji Riha, ji Enqerê, ji Stenbolê, ji Dîyarbekir, ji Qonya, heta ji Tekirdaxê meraqlîyên fotografîyê bo abonebûnê dinivîsin ji me re. Nivîs li ser nivîsan tîn e-maila me, em bi xemgînî hinekan red dikin, bi kêfxweşî hinekan qebûl dikin. Ji me wetrê kes nikare fotografê vê hez û heyecanê me bigire, lê nivîsîna fotografan, fotografî me şaş derdixe: flashhilat, di van kêlîyên jîyanê de, li ber gul û gupikên Gulanê ber bi wî fotografî bi hezar abone ve diherike.

## DEKLANŞOR: "TIZBI"YA KEHRÎBAR A KALO Û "KAŞKIŞIK" A QEDÎM A FÊRÎK

### Mem Artemêt

Ji wan zivistanên yeman bû, ji xeynê hin reşahiyan çûçik te digot qey gund laçikeka spî li xwe pêçaye, li gelek cihan firtoneka berfê li dar bû. Dirûngeyên pêz, seyên ji kevneserdeman mayî û dûyên kulekan ku ber bi joran va diçûn tabloya spî temam dikirin.

Niyet lê hebû ku ji atmosfera derva fotografan derxe, çehvê wî li qehwexaneyekê ket, qehwexaneyeka hingî bêjî ji dinê dûr. Ber bi hundirê qehwê va çû, gurmegurma sobeyê, dengê kevirên okêyê, qirtevirta rûniştiyan û nêrînên ku li ser kesê xerîb belav dibûn hewayaya wir temam dikirin, di destê kalekî da moriyên tizbiya kehrîbar ku rengê qîçik lêdixist li ser hev diçûn, şing, şing, şing...

Yekser ber bi wî kalî va çû. Piştî ku suhbet li hev aliya xwest wêneya kalê bikişîne.

- Xalo dikarim fotrafeka te bikişînim  
- Weyyy! çima nekişîni lawê mi, qayîl î sed livî  
bikişîne, çer biskinim?  
Piştî dengê deklanşorê, wê "tizbiyê" û fotografê  
tenê du risteyên helbesteka Fêrîkê Ûsiv li dar bû;

Şaş nemîne, berxikê min, êh kî dizane,  
Dinê heye "kaşkişika" dest însan e...



**Foto: Mem Artemêt**  
**Çavdêrî Li Qehwexaneyeka Derez**  
**Çêrme - Çewlîg, Çile 2019**

# HÊVÎYÊN REŞÛSPÎ

## Ensarî Caymaz

John cîranê min e. Her dema ku ez di ber mala John ra diborim çavê xwe li min dikeve, dirive û tê cem min, xwe bi şeqê min da wek benîşt dizeliqîne. Sedem jî şekirê qamişî û lolîpop e.



**Foto: Ensarî Caymaz**

**Zarokekî Giran, Zomba - Malawî, Nîsan 2019**

Li Zomba ya Malawî eger şekirê qamişî û lolîlop bi we re hebêsa, li cem zarokan hûn dikarin bibin spîyekî ku jê tê hez kirin.

Li vî cîhê ku ez lê dimînim ji ber ku ez tenê spî me zarok di serî de ji min dûr diketin. Wan dema ku ez didîm ban dikirin, digotin “Nzunguuuu” (Zilamê Spî) û ji min direvîyan, xwe dikirin quncikan. Ji ber ku min zimanê wan baş nizanibû, min nikaribû bi wan ra danûstandin çêkera. Lê paşê min zarok bi şekirê qamişî û lolîlop bi xwe ve girêdan. Hetta bi wesîla zarokan min çend malbat nas kirin. Hevalîya min û John jî bi şekirê qamişî û lolîpop destpê kir.

Dema ez nuh hatimî nêv reşan nedihêlandin ku ez wêneyên wan bigirim û kêfa wan ji kesên xerîb re nedihat. Hevaltîya bi wan re û girtina wêneyên wan pir zemanê min xwar.

Wêneyên zarokên din li hêlekê, gava min dixwest ku wêneyê John bikşînim pir cidî dibû. Her çiqas di vî wêneyî de min zarokekî nakenê kişandîyesa jî li vira hemû kes ji me spîya kêfxweştir in û tim hêvîdar in.

## **WÊNE**

### **Cemal Süreya**

li rawestgehê sê kes;  
mêrik, jinik û zarok...

destên mêrik di berîkên wî da,  
destê zarok di destê jinikê da

mêrik xemgîn e  
nola stranên xembar, dilgiran

jinik bedew  
mîna bîrewarîyên spehî, xweşik

zarok  
xemgîn wek bîrewarîyên bedew,  
bedew wek kilamên dilbiêş...

**Werger: Firat Keklîk**



## MODERNETÎYA JENOSÎDAL

**Fuad Onen**

Ciwanekî Kurd, temenê wî li dor 20 salî, xwendekarê zanîngehê ye. Bi cil û bergên herêmî, li hefsa Dêrika Çiyayê Mazî. Di jîyana xwe ya esasî ya li derve tu caran ev cil li xwe nekiriye. Wî ciwanê Kurd cara yekem di hefsê de dîlan girtiye. Li derve jî xwestîye dîlan bigire an wan cil û bergan li xwe bike, lê nekiriye.

Çima van xwestinên asayî tenha di hefsê de tê bi cîh? Modernîteya te ne ya te, ya dagirkerên te bî rê li parçebûna kesayetê vedike. Di serdema pre-modern de civata Kurdistanê bi xwe re li hev e. Di rewşa asayî de modernîte divê vê lihevbûyinê di asteke bilindtir de rojane bike. Berovacî vê yekê modernetîya dagirker vê lihevbûyinê ji holê radike, ji çanda xwe, dîroka xwe, zimanê xwe bi dûr dixê. Bi sedem ku modernîte ji bo her neteweyî di heman demê de dewletbûyin e.

Tu nebe dewlet û tûşî modernîteyeke dagirker û jenosîdkar bivî tu nikarî ji van encaman rizgar bivî.

Wî ciwanê hane di hindur têkoşîna neteweyî de ev parçebûna kesayetê çareser kir. Ta ku neteweyê wî bive dewlet jî tekane çare bilindkirina têkoşîna neteweyî ye.



**Fuad Onen li Hefsa Dêrikê, 1973**

## KOÇBERÎYA FOTOGRAFEKÎ

### Rohat Alakom

Dema min kopîyake pirtûka xwe ya di derbarê yek ji navdarên kurd Selahaddîn Rastgeldî(1927-1986) ji hemwelatîyê wî Omer Faruk Baran (edîtorê flashhilat) re şand, kêfa wî gelek ji vê pirtûkê re hat. Lê belê di cîhekî peyama xwe de Omer wiha nivîsîbû: *“Heyf ku Selahaddîn Rastgeldi li Rihayê nê nas kirin”*. Dema min ev peyvan xwendin kurdên Serhedê negotî qudimê min şkest. Çawa dibe doxtorekî jêhatî dikaribû wiha zû bihata jibîrkin. Wisa xuya dibe ku di şerê navbera jibîrkin û bîranînê de jibîrkinê zêdetir giraniya xwe nîşan daye, zora bîranînê biriye!

Dr. Selahaddîn Rastgeldî kurdekî ji Rihayê ye ku di sala 1947an de hatiye Swêdê bona tip bixwîne û bibe doxtor. Ji sala 1947an heta sala 1986an li Swêdê dijî. Heman salê li wir dimire.

Dema Selahaddîn Rastgeldî di sala 1966an de çûye Kurdistana Başûr, li ser Misirê re sefer kiriye. Li

Misirê keça Şerîf Paşa, Şerîfe Xanim ya ku di salên 1898-1908an de li paytextê Swêdê Stockholme mabû, dibîne. Şerîfe Xanim dema xatirxwestinê wêneyekî xwe ku berî salan kişandî, wêneyekî zaroktiya xwe dîyarî Rastgeldî dike. Şerîfe Xanimê ew wêne ligel xwe di sala 1908an de biriye Parîsê, paşê Misirê. Wêne heta sala 1966an, qasî 60 salan li bal wê dimîne. Tişteki balkêş e ku du kesên ku têkiliyên wan bi Swêdê re hene ango Şerîfe Xanim û Selahaddîn Rastgeldî piştî salan li Misirê tînin bal hev. Bêguman bi swêdî peyivîne û salên berê bi bîranîne! Rastgeldî jî berî mirina xwe vî wêneyî dide Nacî Kutlay. Hevalê wî Nacî Kutlay jî berî ku ji Swêdê bar bike, vegere Tirkiyê ev wêne di sala 1996an de dîyarî min kir. Qasî 25 sal hene wekî ez bi hewaskarî li vî wêneyî xweyî derdikevim. Di sala 2019an de vî wêneyî bala yek ji wan dildarên wêneyan Omer Faruk Baran kişand. Wî xwest ku ez çend gotinan di derbarê rêwitî û koçberiya dîrokî ya vî wêneyî de bêjim. Wêne çawa li vir xuya dibe gelek dest guhartine, ji nifşan derbasî nifşên din bûye.



Rastgeldî belkî jî kurdê yekem ku rêça malbata Şerîf Paşa ya Stockholmê şopandiye. Çawa tê zanîn Şerîf Paşa di navbera salên 1898 û 1908an de qasî deh salan li paytextê Swêdê, Stockholmê wek sefirê osmanî kar kiriye. Rojnamevanên ku di van salan de çûne mala Şerîf Paşa, çûne seredanê carina qala wan wêneyên ku di dîwarên mala wî

de dardakirî jî dikin. Em di cîhekî rojnameyekê de dixwînin ku wêneyekî keça Şerîf Paşa ya bi navê Şerîfe Xanim (1894-1973) bala rojnamevanekî gelek kîşandiyê. Ev keçika piçûk bi kincên swêdî yê folklorîk û kevin poz daye (Svenska Dagbladet, 19/12 1898). Swêdî ji van kincên jinên ji herêma Dalarna re “Dalkulladräkt” dibêjin. Peyva “kulla” di demên berê de ji bo jinan hatiye bikaranîn. Ev wêne wisa xuya dibe ku di dawiya sedsala 19an de, dema malbatê koçberî Swêdê kiriye (1898) bi gumaneke mezin ji aliye wênekêşa qiraliyetê Selma Jacobssonde hatiye kîşandin. Di binê wêneyekî Şerîf Paşa de jî navê vê xanima wênekêş heye. Serpêhatiya Selma Jacobsson jî balkêş e. Ew bûye evîndarê ermenîyekî Stembolî, zimanzanekî ermenî bi navê Néandre de Byzance Norayr.

Ev wêneyê Şerîfe Xanimê ku berî 120 salan hatiye kîşandin bêguman bi simbolîk be jî têkiliyên kurd û swêdiyan bi şêweyekî vîzuel (dîtinî, dîtbarî) gelek baş simbolîze dike.

## ŞEVBÊRKA JINEKE RÛŞEV BI ŞEVÊ RE

### Gulîzer

Jin jî rûyê xwe dişeqitîne. Rû bi rû ji xwe dişeqitîne. Wek xwe dimîne. Ew rûyên xwe yên ku wek kirasê mareke jê şeqitîye; dike secdeyeke..... tazî, lixwehatî, di hizra evînên xwe yên kevn û di oxira wan de, li xwe mikur tê.

Di navbera dil, laş û mejî de kêl tîn avêtin, li ser wê secdê, li hev tê jin. Di nav êşên xwe de, wek mûmekê di ser şevê de dinisile, li hev tê, li hev dibane.

Cîyê ku jin parçeyên nava xwe, bi hev ve didirû tarî ye, şev e.

Şev jinê li hev tîne. Hingî şev bi rû ye... Ew hêza xwe ji bêrûbûna xwe digre. Mirov çiqas bêrû be, dikare ewqas bi rû be li hember jîyanê û loman jê bike.



Dirûbûn jî ji nexweşiyên xwe yê nexweşik nexşan  
çê dike, li ser jîyanê... Lê kî dikare rûyên xwe yê  
piralî yê bi xêlîyên hezar salî ji şevê veşêre... Ew  
rûyên ku tu bê haya xwe di nav xwe de mezin dikî,  
tînî li ser destê şevê diweliidînî.



**Foto: Deniz Buyuk Kutlay**  
**Jinên Ji Dinyê Birçî Radibin**  
**Stenbol - 2015**



Şev dibe neynik ji pirrûbûna kesan re, mirov hingî bi rûyên xwe dihese, bêrû dimîne, di nav destê şevê de... Nikare rûyên xwe yên heyî, bi tenê bi rûyekî bide der.

Şev rûyê mirov hebo hebo dide ber pozê mirov û jê dibe.

Herkes ber bi wê lîstokê ve diherike, şevê... herkes bi şevê re dibe lîstokeke zarokane ya bi xwe re. Rûyekî te dijmêre, yên din xwe vedişêrin.

Yek hebû...

Yek tune bû...

Paşê mirov di quncikekî nav rihê xwe yê ricifî de rûdine, rû bi rû diaxive, bi xwe re...

Kî bi şevê re rabe û rûne, rihê xwe û rûyên rihê xwe ji nav hev derdixe. Derê wê hinek bi sêr e, rû di wê navbera derî de, wek dîwarekî siwaxkirî û

çeloxwarî bi carekê ve tê xwarê. Paşê li ber te  
rêyeke din vedibe, ji bo te bi dû rûyên te yên din  
bixe.

Rihek li dû rûyekî dîsa di nav şevbêrkekê de ye, bi  
şevê re.

Ka carek xwe bavêje şevê, dawa wê ramûse ku  
mahra rûyê te bi rihê te ve bibirre.


Bi şev tu berê xwe bidî kîjan alî, tu yê rûyekî ji rihê  
xwe yê nisilî bibînî. Di eslê xwe de, her kes  
neynikek e ji te re. Ji ber wê ye dibêjin, mêzekirina  
li neynikan, ne baş e bi şev. Her kesek alîyekî  
kesayetîya te, şîyar dike ji nav te. Her kes tu, tu her  
kes, şev tu, şev her kes.

Şev pîrikek e li ber serê te, ew kesên ku te ew di  
nav xwe de veşartine diwelidîne. Te rû bi rû tîne, ji  
bo xwe hemêz bikî yan jî carinan cilê canê xwe  
bigrî û ji xwe dûr bikevî.....

## BI 'EDALET

### Berken Bereh

min tu li egala xwe nexşandîye  
navê te nivîsîye li ser depa sîngê xwe  
û bi bêhna te şûştîye pora xwe ya kurişî  
ji du peyvên min sê bi te destpê dike  
û ciwanîya xeşîm û cegerdar  
sedeqa serê xewnên te yên bê miraz e  
da nebêjin çavkor e  
da nebêjin xizan e  
da nebêjin nizan e  
welatê min!  
wext e!  
li benda me ye  
karwanê êlê  
xanîyên mil li mil ji hev re bûne pişt  
da em par ve bikin  
bextewarî û azadiyê  
bi 'edalet!



**Bereh ji flashhilatê re dîyar kir ku wî şî'ra xwe ya bi navê "bi 'edalet", di sala 1986an de bo vî wêneyê Şirnexê nivîsîye. Çavkanîyên înternetê dibêjin ku wêne di salên 1930î de hatiye girtin, lê nadin zanin ku wênekarê wî kî ye.**

## **TELÎFÊN FLASHHILATÊ**

### **Nivîs**

Bo çîrok, şîr, pexşan û cureyên din ên nivîsê yê fokusa wan fotograf e 20\$ dolar tê dayîn. Gava bi nivîsê re fotograf jî hebe telîf tenê di ser nivîsê re tê hesab kirin.

### **Werger**

Dirêj kin ferq nake bo hemî wergeran heqê wergerê 10\$ e. Ji Hezîrana 2019an pê ve flashhilat dê giraniya xwe bide ser wergerên nivîsên aktuel yê ji rojeva fotografîk a cîhanê. Di nivîsên aktuel de wergêr divê ji nivîskêr destûra wergerandina nivîsê bixwaze.

### **Fotograf**

Bo fotografên nû hatine girtin û berê li derekê nehatine weşandin 10\$ tê dayîn. flashhilat pirtir li wêneyê berga paşî digere. Wênekar lazim e navekî li wêneyê xwe deyne û li gor xwestina edîtor dikare yek du hevokan jî ser wêne bêje.



## **Distance**

**Lazienki Park, Warsaw - Polonya, Çile 2019**

**Berzê: "Diketin mijê û wenda dibûn, dûrbûna berî wendabûnê bû ew."**